**CEJNA BÊLINDEYÊ**:

CEJNA BÊLINDEYÊ DI NAVBERA XELKÊN ZAGROS Û XELKÊN ÊZDIYÊ DE

**Pêşgotin**:
Cejna Bêlindeyê yek ji cejnên hezaran salî ya Kurdewarî ye ku mizgîniya hatina buharê dide, xatir ji serma û seemê dixwazim û li benda germî û pişkuvîna dar û gîha û heşînê ne, li benda heliyana berfê û teqîna kanî û karêzanin. Şayend e cejn di nava hin netewên derdora Kurdistanê jî bê pîroz kirin, lê kûrahiya wê vedigere Mîtrayî û baweriyên Kurdewarî û Zagrosê. Cejna Bêlinde ramana nûbûna roj û werz(demsal)ên salê ye.

**Navê cejnê di dem û derên cuda de**:
Çend nêrîn li ser navê cejna Bêlindaneyê hene. Yek ji wan dibêje: cejna Bêlindane cejneke pir kevnar e û yek cejnên Mîtrayî ya kevin bûye û xelkî çûne bilindahiyê û agir û keyf û cejna xwe pîroz kirine. Lê rayeke dî heye dibêje: dema çandinî bi dawîn bûye yan jî serma kêm bûye û cotkar bêl û bêlinên xwe avêtine û nav ji wir tê. Helbet çend nêrînên din jî li ser navê wê cejnê hene. Li herêma Mukiryanê jêre dibêjin “Bêlindane”. Li Hewramanê jêre dibêjim: “Serê Merrê”. li Loristan, Kirmaşan û Îlamê jî jêre dibêjim: Buhara Kurdewarî yan jî buhara Kurdane”yê ‹di nav Êzîdiyan de jî weku cejna “Bêlinde, Bêlindane, Mêlinde”yê bernav e ku tev yek cejna Kurdî ya Zagrosê ye

**Cejna Bêlindane li ba xelkên Zagrosê**:
Xelkên Zagrosê her sal di 45 roja zivistanê anku ber bi buharê vê cejnê pîroz dikin.
Ew cejn li rojhilat pir berbelav bû, lê ligel hatina desthilatên Pehlewiyan û bi taybet reza şah, her cejnên li derveyî ecînda û plana wan bûn, qedexe kirin, yek ji wan jî cejna Kurdewarî ya Bêlindaneyê bû, lê çend saleke gelek kod û kokên dîrokî, çandî, hûnerî, mîtolojî, arkolojî û geolojî derket û vejîn bûne û di nav wan de jî cejna Bêlindaneyê ye, bi taybet li herêma Mukiryanê vê cejnê bi awayeke gîrseyî tê pêşwazî kirin.

**Dabên Cejna Bêlindane**:
-Xelkî derdikevin qad û kolanan û rojbaş û pîrozbahî li hevdu dikin bi awayê “Bêlindaneya te pîroz be”
-Vêxistina agirekî mezin gêrîna aheng û şahîyê li dora êgir vê cejnê pîroz dikin.
-Bûk û zava yan jî şêx, pîr, mirovxasek agirê mezin vêdixe.
-Li ber wî agirî mezin ya nava qadê, dareke dirêj li nava agrî datînin, li dora agirê jî çar kolkên darên dinli dora agirî datînin, av, genim, goşt, ketîre li ser her yek ji wan kolkan datînin. Darê dirêj yên ava agirî bi kîjan alî bikeve, ramanekê dide. Bo mînak: eger bi aliyê avê bikeve, tê wateya saleke avdar, şil û bi Bereket dibe. Eger bi aliyê goşt de bikeve, tê wateya wê salê ajalên malî weku pez, bizin, çêl yd.. zêde dibe û bereket zêde dibe. Eger jî bi aliyê genimê ket, tê wateya wê salê genim, dexl û dan zêde û ferr dibe. LÊ eger bi aliyê ketîreyê de kat, tê wateya wê salê dar û daristan bi ferr û Bereket dibe.
-Di vê qadê de rimbazî yek ji dab û lîza cejnê ye.
-Parve kirine şîrînî bi ser amadebûyên cejnê yên li qad û meydanê.

-Çêkirina xwarineke Kurdewarî bi navê “Dokulêw”ê ku ew jî bi germî bi ser amadebûyan de tê parvekirin.
-Di vê cejnê de mêweyên hişkkirî yên zivistanê weku “mêwij, hejîrê hişk, qeysîyê hişk” yd.. bi zar xelkî de tên parvekirin.
-Ev cejn dibe sedema yekgirtî û hevcem bûna xelkên cuda cuda yên Kurdistanê li dora hev.
-Cejna Bêlindane yan jî cejna serê merrê û bihara Kurdane amadekarî û îlan kirine werza çandinî û heşînê ye.
-Lîz û lîstikên “Hespsuwarî”yê yek ji dabên cejnê ye.
-Jendina dehol û zûrne û keyf û şahî pajeke giring a wê cejnê ye.
-Şano, helbest xwendin, vegotina serhat, melet, pend û hûzanên xweş pajeke ji daba cejnê weku şeva Yelda, Newroz û Çarşemba Sor.
-Kesek tawanek kirbe yan şer kiribe yan mirov kuştibe, yan jin revandibe yan jî her karekî nehêja û nebaş kiribe, di roja cejnê de diçe cem, rîspî yan mezinê gund û deverê, destê wî/wê maç dike û dû re wî/wê dibin ba vî agirî mezin ya li qadê û piştî ew tobe kirin, wî/wê efu dikin.

**Bêlinde di nav xelkên Êzîdiyê de**:
Cejna Bêlinde yan jî Mêlinde di nava Kurdên Êzîdî Kurdên Yarsan û Musulman weku cejna dawîhatinê tê pîroz kirin. Çileya zivistanê paja heşt deman dibin ku ew jî “Bêdirxe, Bêlinde, Mêrem, Ogen, Pît, Paloz, Xidir, Eylas” ku her yek ji wan pênc rojan berdewam dikin, tên pîroz kirin ku dikeve hefteya sê ya meha kanûna yekê bi salnameya rojhilatê. Bêlinde yan jî Mêlinde di wateya bilind bûna roj û ronahiyê ye. Her weha tê bawer kirin û vegotin ku di nava Medyayê û bawermendên Mîtrayî de jî ev cejn bi heman awayî hatiye pîroz kirin. Cejna Bêlindeyê hem cejna bi dawî bûna çandiniyê ye û hem jî sedema mukum kirin û xort kirine civakê ye.

**Dabên Cejna Bêlindane**:
**-**Di çanda Êzdiyan de dema cejna Bêlindeyê tê, di roja çarşem û pêncşemê de cejn tê lidarxistin.
-Xelk bi taybetî jin diçin ser zehman û menzelên miriyên xwe û li wir cilank yan çilankê jî bi xwe re dibin û xwarin belav dikin. Her kes û agirekê li ber serê miriyê xwe hildike bi ramana bereketa ronahiyê. Xencî wê mûzîk anku def û şimşalê bi xwe re dibin û li wir wê dijenin.
-Êvara cejnê rîspî, qewlbêj û micêwiran li Laşê û gundan kom dibin, çirayê Xasan vêdikin û duayên spasguzariyê dikin.
**-**Sewk, rojek berê cejnê “Sewk”ê çê dikin ligel, naneke stûr li ser sêlê yan jî tendûrê tê pêjandin.
**-**Keşk û şilik”ê. Şilik û Sonî li ser sêlê tê pêjandin û tevî doşavê dikin bo demekê û dûre bi ser endamên malê tê parvekirin.
-Xwarineke dî “Keşk û Kişam”e ku ji mast û savarê tê pêjandin di werza havînê, ber tavê hişk dikin û hildigirin ji bo zivistanê û cejna Bêlindeyê.
-Serdanî, her kes di êvara cejnê de derdikevin û mal bi mal digerin, xwedî mal mêweyên taze

û hişk didin xelkên li ber deriyê û cîran diçin malên hevdu û xwarinên pêjandî dibin ji hevdu re.
-Dûre hemû bi hev re diçin qadek û agirekî mezin vedikin û li dora êgir şahî û govendê digirin bi navê agirê “Gurgega”yê ku sembol û ramana ronahî û berketê ye, dema ku cotkar û çêneran ji zeviyê vedigerin, berê bigehin malê, li pêşiya dêlîzê, cotiyar û çêner hin reşkê bi xwe re dianîn û agir bi “Reşk”ê vêdixstin û gayê bi ser de derbas dikirin. reşkê gîhayeke jehrîn e, ajal bixwin pê dimirin. Her weha her kes bi ser agirî paz dide û slogana “Gurgega sala nû” dibêjin. Kavan jî mêweyên hişkkirî yên zivistanê diavêtin û zarok pêwer dibin ku ev jî spasguzarî ye ji xweda û xwezayê re.
-Kavana malê “Êmîşa”yê çê dike ku şîrînîyeke û tevî genimê dikin û bi ser beşdaran de parve û belav dikin.
-Piştî gurgega bi dawî dibe, “Xewlêr yan Xewle yan jî Xewrê”yê çê dikin ji ard-hevîrê û rûnê yan jî zeyt û kunciyê, ji nanê normal stûrtir e û mêwijekê têde, weku sembola tavê û dixin ser serê xwe li gor endamên malê belav dikin. Li gor baweriyan Êzîdî mêwijê têde bie behra kî, ew wê salê xêr û Bereketê dikeve jiyan û mala wê/wî.
-Cilank yan jî Çilank, patek qûmaşa rengal e, lê zêdetir sor û qahwayî ye bi dirêjya metek çargoşe, nên dixinê yan jî datînin ser û dibin xane û dîwanan.
-Piştî duyayên spasguzariyê, dêne dora agirî û bi dehol û zûrne, germahî û şahiyên xwe dikin.

**Encam**:
-Cejna Bêldaneyê li gor ewê ku di nav olên Kurdî û deverên Kurdistanê berbeilav û xwedî dîrokeke çendîn hear salî ye, girêdana wê bi xweza û agir û ronahiyê, bêguman rewşa wê vedigere dema ol û baweriya Mîtrayî ya Kurdî û kevnar.
-Giring e ji her çar aliyên Kurdistanê giringiyeke kûr û baş bidin van nirxên Kurdewarî û kevnar. Li her dever û herêman bihê vejiyandin.
-Li gor pîrozkirin û ramana cejnê, wate û raman nêzî hev in, lê hin cudahî jî di anvbera “Bêldane”ya Zagorsî û Êzîdî de hene ku hêjayê lêkolîn û nîqaşê ye.
Di her du cejn de mijara “dawînhatin”ê heye, di Êzîdî de dawîhatina çandiniyê û di Zagrosî de dawîhatina sermayê.
-Kûrahî û ramana cejna Bêlindaneyê, vê yekê ji me re dibêje: ku her du cejn bêne hevta û yekta kirin û weku cejneke Kurdewarî her sal weku cejnên Newroz, Yelda û Çarşema Sor, bê vejiyandin.

//Lêkolîn û Nivîsîn: Qendîl Şeyxbizînî